https://anmeldung.salzburg-testet.at/#/public/vaccination-self-registration

Hûn dikarin li vê derê **ji bo vaksîneke COVID19 a bêmûçe û dilxwazî ya li eyaleta Salzburg'ê navê xwe bidin qeyd kirin.** Piştî navnivîsiyê hûn dikarin li gor daxwaza xwe, ji xwe re navendeke vaksînkirinê hilbijêrin.

Hûn dikarin hemû agahîyên di derbarê vaksînkirinê û herweha di derbarê bernameya vaksînê ya eyaleta Salzburg'ê de li vê navnîşanê peyda bikin. Land Salzburg - Corona-Impfung. Hûn dikarin herweha ji bo agahînameya Corona ya eyaleta Salzburg'ê (Corona-Newsletter des Landes Salzburg) abone bibin.

BALDARÎ: Herî dereng heta dawîya meha Hezîranê qeyda ji bo vaksîna COVID19 bi tenê li cem navendên vaksînê pêkan e. Herî dereng ji meha Temmûzê û pê ve qeyda li cem doktorên malbatî û li cem doktorê we yê taybet ê dezgeheke vaksînê dîsa li ser înternetê dikarin werin peyda kirin.

Hemû agahiyên din hûnê di demeke nêzîk de bi Email yan bi SMS'ê werbigirin.

Ji Kerema xwe ji bîr nekin:
Ji bo qeyda online divê telefûneke we ya destî hebe, ku dikare SMS bistîne û hejmareke we ya bîmeya sosyal (sîgortaya sosyal) a Awisturyayê hebe.
Kesên bêyî hejmara bîmeya sosyal a Awisturya'yê ji kerema xwe serî li xeta telefûnê ya 1450 bidin.
Kesên bê telefûna destî ji kerema xwe serî li xeta telefûnê ya 1450 bidin.

---

https://anmeldung.salzburg-testet.at/#/public/vaccination-appointment-self-registration

Li vê derê mirov dikarin li gor qaîdeyên pêştiriyê yên lijneya vaksînê ya netewî **randevûyeke ji bo vaksîna Corona'yê bistînin,** heger ew hatibin qeydkirin û TAN-Codeke çalak gihaştibe destê wan.

Bi TAN-Code hûn dikarin randevûyeke vala di dezgeheke vaksînê yan navendeke vaksînê ya li eyaleta Salzburg'ê de bistînin.

Wergirtina randevûyê bi tenê weha pêkan e, heger we ji bo vaksîna Corona'yê hatibin qeyd kirin û ji bo randevûyeke yan bi Email yan jî SMS'ê vexwendnameyek wergirtibin. Li gor agahiyên we yên peywendiyê hûnê ji bo randevûyekê bi Email yan SMS vexwendnameyekê werbigirin. Heger we agahiyên ji bo peywendiya dîjîtal nedabin wê demê hûnê bi rêya telefûnê ya ji navenda xwe ya vaksînê randevûyeke vaksînê werbigirin.

Wergirtina randevûyeke serbixwe bi tenê bi TAN-Code pêkan e, ku hûn yan bi Email yan bi SMS'ê vê kodê werdigirin. Ev TAN-Code ewê bi awayekî çalak ji we re were şandin.

Hemû kes di dawiya pêvajoya qeydbûnê de formeke agahî û rizamendiyê werdigirin. Ev form divê werin dagirtin û çap kirin, da ku hûn wan bi xwe re bînin randevûya xwe ya vaksînkirinê.

Heger hûn di koma rîsk û rîska zêde de bin, di dawiya pêvajoya qeybûnê de hûnê formeke din jî werbigirin. Bila doktorê/a we, ku we tedawî dike, vê formê dagire û paşê wê çap bikin û bi xwe re bînin randevûya vaksînê.